VÎRÛSA KORONAYÊ (CORONAVIRUS): HEKE GUMANA TÛŞBÛNA BI VÊ VÎRÛSÊ LI SER KESEKÎ HEBE, DÊ ÇI BIBE?

GELO YEK JI KARMENDAN BI GUMAN E KU BI VÊ VÎRÛSÊ KETIYE?
DI VÊ REWŞÊ DA, EV KIRYAR DÊ PÊK BÊN!

LI MALÊ AN LI CIHÊ KAR



KUXÎN, TA (GERMAYA LEŞÎ), PIRSGIRÊKÊN BÊHNKIŞANDINÊ: DI VÊ REWŞÊ DA, IHTIMAL HEYE KU EW KES TÛŞÎ VÎRÛSA KORONAYÊ BÛBE.

HEKE LI CIHÊ KARÎ: BILEZ BERÊ XWE BIDE MALÊ. PIŞTRA: BI RIYA HEJMARA TELEFONA 1450 DIGEL BEŞA XIZMETÊN GELEMPERÎ BIKEVE TÊKILLIYÊ.

TÊKILLIYA TE DIGEL 1450: KEDKARÊN XIZMETÊN LÊMIQATEBÛNA TENDURUSTIYÊ, TE DINIRXÎNIN DA KU TÊBIGIHÊJIN KU GELO TU HEGEREK JIBO PÊKANÎNA LÊKOLÎNA ZÊDETIR HEYE AN NA.

BERIYA DANÎNA TÊKILLIYÊ: JI KEREMA DIGEL KESEKÎ KU BI ZIMANÊ ALMANÎ DIZANE, HEVAHENG BE DA KU GOTÛBÊJAN JIBO TE WERGERÎNE.

TESTEKE "SWAB" DÊ PÊK WERE. MIJARÊ JI XWEDIYÊ KARÊ XWE RA BIBÊJE.

DI HEYAMA KU NIMÛNEYA WERGIRTÎ JI TE TÊ HILKOLANDIN, KESÊN KU TÊKILLIYA TE BI WAN RA HEBÛYE, DÊ WERIN NIRXANDIN: TÊKILLIYA TE BI ÇI KESÎ RA HEBÛYE?

TÊKILLIYA NÊZIK:

HEKE ENCAMA TESTÊ POZÎTÎV DERKEVE: BERPIRSÊN BEŞA TENDURUSTIYÊ DÊ BI TE RA BIKEVIN TÊKILLIYÊ Û DESTÛRÊ BIDINE TE KU BI QASÎ DU HEFTEYAN BIKEVÎ REWŞA QERENTÎNEYÊ. KESÊN TÛŞÎBÛYÎ BI VÎRÛSÊ DIVÊ KU VÊ MIJARÊ JI XWEDIYÊ KARÊ XWE RA BIBÊJIN.

HEKE HAT PIŞTRASTKIRIN KU TÛŞÎ VÎRÛSÊ BÛYÎ:

DÊ JI ALIYÊ BERPIRSÊN BEŞA TENDURUSTIYÊ VA, DESTÛRA QERENTÎNEYÊ JIBO TE WERE DAYÎNÊ. KESÊN TÛŞBÛPYÎ BI VÎRÛSÊ DIVÊ VÊ MIJARÊ JI XWEDIYÊ KARÊ XWE RA BÊJIN.

TÊKILLIYA BI ASTEKÊ RA:



TAMÎ TÊ KIRIN KU REWŞA XWE KONTROL BIKE Û KIRYARÊN DIN KU BERPIRSÊN TENDURUSTIYÊ DESTNÎŞAN DIKIN, BERÇAV BIGIRE Û JI XWEDIYÊ KARÊ XWE BIPIRSE KU GELO DERFET JIBO XEBATA JI DÛR VA (DÛRKARÎ) HEYE AN NA.

ÖSTERREICHISCHES ROTES KREUZ

Aus Liebe zum Menschen.